KOVARA

MUZÎK Û HINER

Sal 2 Hejmar 4 Havîna 1981 - 2593 kurdî

BO DÎNDARÊ XWÎNMÊJ

Hey zikreşê dilmişt qirêj !
Tu bes bimîne şaş û gêj
Ku xwînmêj û birakuj bî
Te bo çi ye rojî û nivêj?
Sed tif li nav çavên te bit
Meke nivêj! Xwînê merêj!
Ne ji bo keran bûye beyda
Ew behişta pan û dirêj
Tu req bibî tu nabînî
De her bibêj û her bipêj!

Mamoste
Sebrî Botanî

Tenbûrvanê sitembar û hovîtiya misilmantiyê (rûpel 19)

www.arsivakurd.org

GIRÊ SÎR E

Ji devê **Hûrî Botanî** Notenivis:- **Beşîr Botanî**



Girê sîr a bi sîr e Lê lê, lê lê Meyro
Gir xopanê bi sîr e Şox û şengê Meyro
Du swara hîr û hîr e Lê lê, lê lê Meyro
Yarê Meyro pir jîr e Şox û şengê Meyro

Girê sîr a bi ce ye Lê lê, lê lê Meyro
Gir xopanê bi ce ye Şox û şengê Meyro
Du swara hey û hey ye Lê lê, lê lê Meyro
Yarê Meyro file ye Şox û şengê Meyro

Girê sîr a bi nîsk e Lê lê, lê lê Meyro
Gir xopanê bi nîsk e Şox û şengê Meyro
Du swara hîsk û hîsk e Lê lê, lê lê Meyro
Yarê Meyro bilalîsk e Şox û şengê Meyro

www.arsivakurd.org

Girê sîr a bi pîvaz e — Lê lê, lê lê Meyro
Gir xopanê bi pîvaz e — Şox û şengê Meyro
Du swara naz û naz e — Lê lê, lê lê Meyro
Yarê Meyro tolaz e — Şox û şengê Meyro

Girê sîr a bi dar e — Lê lê, lê lê Meyro
Gir xopanê bi dar e — Şox û şengê Meyro
Du swara lar û lar e — Lê lê, lê lê Meyro
Yarê Meyro dildar e — Şox û şengê Meyro

DÊRE SORÊ

NOTANIVIS:- **Nûra Cewarî**



www.arsivakurd.org

Dêre sorê biçûkê,
lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, wey lê, lê
Dêre sorê biçûkê
Hine li destê bi neynûkê
Par keç bû, îsal bûkê,
lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, wey lê, lê
Par keç bû,îsal bûkê
Berxê! Sebra mala minê! Wey lê, lê

Dêre sorê mezinê,
lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, wey lê, lê
Dêre sorê mezinê
Hine li destê bi bazinê
Par bûk bû îsal jinê
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, wey lê, lê
Par bûk bû îsal jinê
Berxê! Sebra mala minê! Wey lê, lê

Endfwer e, paytext e,
lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, wey lê, lê
Endfwer e, paytext e,
îznê bide bêm rex te
Te mabû soz û bexte
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, wey lê, lê
Te mabû soz û bexte
Berxê! Sebra mala minê! Wey lê, lê

www.arsivakurd.org

HINERA NÛ
Notenivîs:- Beşîr Botanî

DILBER

Helbest û awaz:-
Hinermendê mezin **TEMO**



Gelek hêja yî dilber, wek gula xemrî
Çavê te reş in dilber, reşekî tarî
Tu pir şêrîn î dilber, tu gulbihar î
Ji bo evinê dilber, her dem tu karî

Ez birîndarê ewrê wan çavê te me
Ku te dibînim gelek ez bê çare me
Ez dil bi kulê êşa evîna te me
Ew navê li ser te dilber ji min re xem e

Min ciger nîne dilber bêjim wî navî
Çavê m' dijwar in dilber wê te hingav î
Rind î, bi evîn î, dilber, wek roj û tav î
Bo min biha yî dilber, roniya çav î

www.arsivakurdi.org

Helbest:-
Mamoste Sebrî Botanî

Awaz:-
Beşîr Botanî

GULBIHAR Û PELÎTANK

Music

Song



Dît- ra ro-jêliser ba- nî mili sermi-lê wî da - nî



Ya te go-tî min ew got ez di gel xweki-rim cot



Gu-lê pa key- fa wî hat Maçek bo min kir xe-lat



Go-te min bê- je Fa - tê bê min neçit ci- va-tê

Dîtra rojê li ser banî — min li ser milê wî danî

Ya te gotî min ew got — Ez di gel xwe kirim cot

Gulê pa keyfa wî hat — Maçek bo min kir xelat

Gote min bêje Fatê — Bê min neçit civatê

— — —

Gulê ji nû min zanî — Yarê te ye Botanî

Gotinek kir wek şekir — Wî dilê min pê vekir

Pir xweş û nerm û têr tam — Şîr û şêrîn şekrê şam

Hingî gava paştir bû — Şêrîntir û baştir bû

www.arşivakurd.org

Gulê nadim malê dinê Li ser wê têm kuştinê

Li ser wê tirh û katê Agir û befr û ba tê

Ewrê evîna caran Dîsa kir befr û baran

Ewrên me reş û tar in Şîn û şadî dibarin

www.kurdishakurd.org

Helbest:-
Ehmed Cantekîn

Awaz:-
Beşîr Botanî

ZIMAN Û WELAT



Li karê, li malê,
li gund û li çolê,
li nav bax û bexçan,
li nav rez û daran
em bi KURDÎ dipeyivin, dipeyivin.

Li erdê xwe dijîn,
dilîzin, distirên,
çîrokan dibêjin,
helbestan dixwînin,
tim govend û lîlî dikin û dikenin.

(meqam)
Em kurd in, gelek adetên me baş hene
Pir xwarin û vexwarinên me xweş hene
Şal û şepkên me çi rengîn û ciwan in

www.arsivakurd.org

Miletê me maye,
welatê me heye,
KURDISTAN, KURDISTAN,
Kurdistana ciwan
Va ye hawar û qêr dike li bin destan.

GOVENDA EFRÎNÊ Beşîr Botanî



---

kovara Muzîk û Hiner
Bixwîn in û belav bikin

www.arsivakurd.org

Jîn û Muzîk

Beşîr Botanî

Jîn kar û xebat e. Evîn û axaftin e. Xwarin û vexwarin e. Zehmet û xweşî ye. Tarî û ronahî ye. Muzîk û gerdek e(zewac) û hd. Muzîk jî bi xwe beşeke mezine ji jînê. Lê mixabin gelek kes hene ku vê yekê bawer nakin. Her wisan gelek hinermendên derew jî hene nizanin ku mebest(meqsed)û armancê çi ne?! Aya! gelo! çima axaftin yan xwarin beşek in giring in lê ne muzîk e?! Ez dixwazim bi cihbînim ku muzîk giring û pêwîst e û beşeke mezine ji jînê.

Hindek yan gelek ji me dema ku li perçeke muzîk dibihîzin, têdigihên ku ew perça muzîk çi ye? Gava em dibihîzin, bi dilxweş yan bi dilxemgîn dibin û hd. Lê em dê çawan ew hest(îhsas)werge-

www.arsivakurd.org

rînine axaftinê?

Gelek corên muzîk hene. Lê her perçeka muzîk ji bo her mirovekî ji me têgehiştina wê cuda ye. ji ber ku ev yeka ha li ser sirûşta ku em li wê derê mezin bûne, nêrîn û serpêhatina jîna me girêdaye.

Dema ku em diçin govendê, goristanê, yan dema ku em cejna Newrozê pîroz dikin. Dema ku bab û dapîrên me çirokan bo me dibêjin. Dema ku mirov bi fîkan piyasê dike û li pêlweşê(radyo)dibihîze. Hema di wê demê de gelek awazan têne bihîstin. Awazên xweşî, şînî û hd. Ev jî xuya dike ku muzîk gelek giring û pêwîst e û rola wê bingehîn e.

Ji gelî hevalan re
Dîwana helbestvanê mezin
Osman Sebrî hate çapkirin!
Dîwana helbestvanê nîştiman-perwer bixwînin û belav bikin!

www.arsivakurd.org

KOŞEYA WÊNE

Kak Ehmed Cantekîn wênekarekî û helbestvanekî kurd e(bi nijadê xwe ermenî ye). Mirovekî Kurdistanî ye. Gelek wêne û helbestên ciwan û baş li ser Kurdistanê li nik wî hene. Helbestekê ji helbestên wî di vê hejmarê de bi awaz hate belavkirin. Wêneyên wî yên baş, ciwan û giranbiha bi destên me neketine da ku em belav bikin. Her wisan li kêmasiyê nenêrin.

www.arsivakurd.org



Hinermendê rastîn, awazvanê zane û tenbûrvanê mezin **T E M O**

www.arsivakurd.org

Dibistana

ARAM TÎGRAN

Ji bo fêrbûna muzîkê

Berhevkirina Beşîr Botanî

GUHÊROK, pênc guhêrok hene:-

	Ferensî		Kurdî
1-	Diyêz	♯	Nîvbilind(bilindkirina deng bi nîv deng)
2-	Kar diyêz	𝄪	Çarekbilind(bilindkirina deng bi çarek deng)



3-	Bîmol	♭	Nîvnizim(nizimkirina deng bi nîv deng)
4-	Kar bîmol	𝄫	Çareknizim(nizimkirina deng bi çarek deng)



5- Bîkar ♮ Zivêrok(deng bo cihê xwe dizivirîne)



Ta hejmar-5-

www.arsivakurd.org

(JI GOTINÊN NEZANAN)

Rizgar Memo

Ayetullah Xelxalî dibêje:-

Ez dê tilî û zimanên hinermendan bibirim, eger tilî û zimanên xwe nabirin.

Ayetullah Mihemed Behiştî dibêje:-

Dengê dehol û zirne jî beşek in ji muzîkê ne. Divê em van pêwengan(aletan)jî qedexe bikin. Ji mîkroban(hinermendan)bistînin û bişkînin.

SIPAS JI HEVALAN RE!

Kovara MUZÎK Û HINER sipas ji hevalan re dişîne. Bi taybetî yên ku pere, alîkarî û pirtûkan ji bo kovarê şandine. Wek

1- Ji hevalekî bê nav-Ferensa

2- Ji hevalekî bê nav-Libnan

3- Rafîk Hîracyan-Sûrî

4- Mîxayîl -Elmanya

JI BO ALÎKARIYÊ, postgirokonto 453 46 47-5
Bashir Botani
Sweden

KOVARA MUZÎK Û HINER BIXWÎNE Û BELAV BIKE!
ALÎKARIYÊ JÎ BIŞÎNE Û TEV JI BO DOZA **KURDISTANÊ**.

www.arsivakurd.org

(ADET Û RÛMETNAMEYÊN KURDAN)
1858-1859
(Mela Mehmûdê Bayezîdî)

Berhevkirin û
rastkirina:-
Hevalekî hêja

Zivistanan kurd sibe û êvaran diçine odeyên axan û du-sê seetan rûdinin û çîrokan dibêjin. Yaxud behs û şerên borî û pergalên borî dibêjin. Wekî nîvroj bûyî têne malên xwe û nanî dixun û alifên dewarên xwe didinê. Îcarî eger heyam xweş e, berhev dibin li ber rojê li cihekî rûdinin û dîsanî qelûnê dikêşin û dipeyivin. Bi şev carnan dibitin ku eger gûz peyda bitin distînin û dilîzin, ew jî qumar e. Hindik didine derê. Ciwanên wan law, keç û bûk zivistanan her şevê li malekê yexnaxî li wê malê berhev dibin. Eger saz hene, sazan lêdixin. Eger saz tune bin lawên dengbêj, bûk û keç tevî hevdu bêrîtan dibêjin û distirên û govend digirin û dîlan dikin, heya nêzîkî sibehê. Îcar her kesek belav dibin û diçine malên xwe. Piranî du şev û sê şevan carekê hêrguz(îlla)yexnaxî di nava gundiyên kurdan de dibin. Eger li gund file(ermenî)hebin, law û keçên wan jî tevî kurdan dibin û pêkve govendê digirin û dilîzin.

www.arsivakurd.org



Sêrko Botanî

Vegirkerên sitemkar û dijminên xwînmêj bi alîkariya hêzên emperyalist şiyan ku welatê me perç perçe bikin. Lê hovên nijadperest jî dixwestin ku me beş beş û me pirt pirt bikin û ta niha bi vî karî jî mijûl in.

Em gelên Kurdistan in. Bira û dostên hev in. Rêka me yek e. Doza me jî yek e û bi hev re li yek welat dijîn. Ji ber ev e jî çand û folklora me gelek nêzîkî hev bûne. Ev çand û folklora ha bi saye serê bab û bapîrên me yên ku bi xebata dirêj û bi rezaletî hindek bo me parastin. Divê em jî wekî wan ev çand û folklora ha ji nemanê biparêzin. Lê xebata parastina çand û folklorê gelek dûr û dirêj e û gerek e bi zanîn û bingeh be. Lê destpêka wê divê bi şerê nijadperestî be. Her wisan divê em çavên xwe vekin û dijminên xwe nas bikin. Çiku çand û folklor jî beşek in giring in ji şoreşa azadiyê. Lê bê xebata rastîn ya bi zanîn û bingeh em nagihên mafê xwe û rêka azadiya me gelek dûr û zehmetir dibe.

www.arsivakurd.org

wêne û note

B. Botanî

MIXABIN

Ji hinermend xuşka Necat Mihemed Sidîq re

Roj hilat, roja evîndaran
Mizgîniyek e bo Kurdistan
Hiner bo me hilbijart
Germiya evînê bo me hinart

Gul geş bû, gula evînistan
Bi stran û bi helbestan
Gava li evîndaran silav kir
Bêhna evînê belav kir

Finda hinerê vebrûsî, bi dilxweşî û duristahî
Jîna me jî geşkir bi ronahî
Silav û evînên xwe pêşkêşkir bona welat
Pîroz be û her bijî xuşka Necat

Roj, gul û find bi evînê geşdibe
Hiner bi evînê xweşdibe
Çû ava, çirmisî û vemirî, me evîn jî neda yê
Nê leva me bê hinera wê nayê

Gava çû ava, çirmisî û vemirî
Kovan nalî û girî
Nê hinera bê roj, bê gul û findan
Weke Kurdistan bê çiyan

Ey roj, ey gul, ey find, bizivire bo hinerê bizivire
Bi dilxweşî jî binvîse û bistire
Tu hinermend î, xwe geşbike
Dilê hemyan jî xweşbike

Me nehişt ku ew binvîse, bistire û bikene
Nê ew germî, bêhn û ronahiya biharên me ye
Nê qenciyekê bi me re kir
Mixabin me qencî jî ji bîr kir

Roj, gul û finda me bi dilxweşî her nema
Bê gewz, henek û sema
Mixabin ku xwe veşart
Rêka jîn û evîna xwe jî guhart

Beşir

www.arsivakurd.org

NÛÇEYÊN HINERÊ

Tîgran Sîmonyan

Kak A.D tenbûrvanekî ji tenbûrvanên Îranê ye. Berî salekê ji aliyê partiya Îslamî ve li Esfehanê hate girtin. Nêzîkî 6 meh li jêr lêdan û tif bû. Rojê carekê xwarin didanê. Tenbûrvanê me gelek nexweş ketibû. Paşê melayê zîndanê biryar da ku wî derxînin û bişînin nexweşxwana Tehranê. Li wê derê jî çar meh mabû. Lê nexweşiyên wî bê çare bûn. Piştre ji nexweşxwanê derket û niha di mala xwe de dijî. Lê çawan dijî? Jîna wî pir zehmet e. Ew gelek nexweş e. Bê kar e. Bê pere ye. Bê kes e û ji tirsan kes neşêt ku alikariya wî bike.

Hevalên delal! Ji ber ku kak A.D tenbûrvan e, ji lew re hêzên Îranê û Kurdistanê behsa wî nakin. Lê eger ew endamê partiyeke kartonî ba, hema wan hêzên kartonî di wê demê de dest bi peyivên vala di kovarên xwe de dikiribane. Ew çima? Ma mirovê tenbûrvan ne xebatkar e?! Ne xem e, bila tev bizanin ku mirovên hinermend sitembar in û naxwazin li bin piyên hêzên xwefiroş û mirovên debeng(ehmeq)bijîn.

www.arsivakurd.org

Hinermendê RASTÎN dikare pesna rewşa xwe, gelê xwe, sirûşta welatê xwe û tiştên din bi MUZÎKÊ bide.

Hinermendên ZANE bi XEBATA RASTÎN digihên HÊVIYA xwe ya ji bo DOZA HINERÊ. Ji lew re jî divê em jî îro de DESTPÊBIKIN

DIVÊ hinermendê zane hinera gelê xwe ji ne-MANÊ biparêze. Bi HELBEST û AWAZA stranê NELÎZE û NEGUHIRE.

Yê ku bixwaze jîna xwe PÊŞBIXÎNE
Divê muzîkê BIXWÎNE

Jîna mirov bi muzîkê JÎN e
Laşê wî jî her dem bi EVÎN e

Mirovê jîr, ji muzîkê re TÎ ye. Çiku muzîk JÎN e û jîna bê MUSÎK, wek ERDÊ bê AV e.

Jîn bi hinerê RENGÎN dibe. Ciwanî û xweşiya wê MUZÎK e.

Beşîr Botanî

Xudan û berpirsiyarê kovarê:- Beşîr Botanî
Wêneyên hinerîn:-zarokê hêja Bêrîvan Xelîl

Ji bo alîkariyê, postgirokonto 453 46 47-5
Bashir Botani Sweden

www.arsivakurd.org